


Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl) | wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî
Xelek 7

# Êrişa Erebî-Îslamî li Kurdistanê

## Rewşa Kurd pêş Êrişa Erebî:

Piştî têkçûna *Emperatoriya Madan* bi destê Farisan sala 550 b.z. dîroka Kurd bi temamî ne avêne û zelale; bi taybetî jî ew dema dîrokî ya di navbera pêkhatina *Emperatoriya Aşxanî* (*Erşak*) ya *Ariyanî* sala 250 b.z. û *Êrişa Erebî* da hinekê tarî ye. Ev dem, dora 900 sal dikişîne. Dibe ku hin jêderên Farisî yan Ewropayî hebin, ku derbarê vê heyamê, agahdariyên di wan da bi sûd û feyde bin, lê belê heya niha ew jêder neketine destê me.

Hebûna navê "*Kurd*" vedigere *Heyama Somerî* û maneya vê gotinê di wê demê da dihate maneya "çîyayî" yan jî rewişt û taybetmendiyên wek "dilêr", "tirsnak" û "tund". Wisa tê xuyakirin ku di dema *Aşxanî* da peyva "*Kurd*" cihê peyva "*Mad/Mîd*" distîne. Di dawiya *Heyama Aşxanî* da peyva "*Kurd*" hatiye vejandin, lê belê tenha bi maneya "*Çiyayî, Şivan, li şûnmayî*". Em vê yekê wisa guman dikin, ji ber ku gava *Erdeşêr kurê Babek kurê Sasan* li dijî padîşahê *Aşxanî* yê bi navê *Erdewan* serî hildide, ew ji *Erdeşêr* ra dibêje: "*Ey Kurdê li bin konê kurdan perwerdebûyî...*" wek ku dîrokzan *Al-Tabari* nivîsandiye[1].

Li gor xeberdana *Al-Tabari* hin lêkolînerên dîrokî bawerdikin ku malbata *Sasanî* bi koka xwe Kurd bûye û ji êla *Şewankare* bûye, ew êla kurdên revend (goçer), ya ku li herêma Fars li başûr-rojavayê Îranê dima. Ji agahdariyeka din ku li ser zimanê *Abo Henîfe Al-Dînewerî* hatiye tê fêhmkirin ku peyva "Kurd" ji maneya xwe ya baş hatiye valakirin û tenha maneya "Şivan, li şûnmayî" girtiye. Ew dibêje ku di dema xwe da *Sasan* ji bavê xwe *Behmen* tore bûye (xeyidî ye), hin mîh birine, çûye çiyan, li nav Kurdan şivantî kiriye; ji

qehra bavê xwe ra dev ji jiyana bajarvaniyê berdaye. Li ser vê xeberdanê navê *Sasan* bi şivanê miyan hatiye naskirin û gotine *Sasanê Kurd* yan jî *Sasanê Şivan*[2].

Me di jêderan da belgeyeka ronak û bê guman nedît ku kurdbûna *Emperatoriya Sasanî* mêlag û îspat bike. Wek ku hatiye naskirin, ew hem ji hêla çandî û hem ji hêla gerînendeyî (rêveberî) da farisî ye. Heger ew Kurd bûya - emperatoriyeka wisa mezin - diviyabû *Emperatoriya Madan* vejandiba û Kurd ji bin serdariya Farisan rizgar kiriba; û taybetmendiyên xwe jî dê aşkere kurdî bana. Heger rêveberiya wê Kurd be jî, ew bi çand û siyaseta xwe bûye Faris. Wek *Dewleta Eyyûbî* ya ku rêveberiya wê Kurd bû, lê di warê çand û siyasetê da erebkirî bû. Bi gelemperî, pirsa bingeh û rahên Sasaniyan hîna bi temamî nehatiye zelalkirin. Em li benda agahdariyên berfirehin da ku em bigihînin biryareka dawî.


Ya girîng di vê mijarê da ewe ku gava *Êrişa Erebî* sala 636-an z. gihîştiye Kurdistanê, ji bo Kurdan avahiyeka siyasî (dewletî) tinebû ku rêzên wan bike yek û li hember vê êrişê raweste. *Emperatoriya Sasanî* li kurdistanê serdar bû; ji başûrê Kurdistanê bigire heya tixûbên Niseybîne. Beşê din ji Kurdistanê di bin serdariya *Roma Bîzantî* da bû. Kurdistan di warê giyanî-olî da jî ne xwediyê avahiyeka rêveberiyê bûn ku wan di rewşên wisa giran da bicivîne ser hev. Wek me berê jî gotibû: Zerdeştîtî wek ayîna fermî ya *Emperatoriyên Farisî* bi darê zorê avêtibûn ser piraniya Kurdan û bûbû wek îdeologiya *Serdariya Farisî* ku dijminahiya avakirina çi dewleta kurdî dikir. Beşekî ji Kurdan jî ola Kirîstiyanî wergirtibû; û wisa çarenûsa Kurdan di wê demê da bi *Emperatoriya Sasanî* û *Emperatoriya Romî-Bizantî* va hatibû girêdan.

## Şopên Êrişa Erebî li Kurdistanê:

Di sala 632-an z. da *Pêximber Muhemed* wexer kir, *Abo Bekir Al-Siddîq* bû xelîfe. Wî hemû serhildanên hundirîn ku li dijî *Dewleta Xelîfe* serî hildan vemirandin. Da ku rê li ber serhildanên hundirîn bigire, hemû Ereb civandin ser hev û çavên wan berdan ser xêr û bêrên welatên Şam û Îraqê. Rabû di bin durişma "*Belavkirina Îslametiyê*" da berê leşkerê xwe sala 633-an z. da ser rêya êrişkirina Sûriyayê û sala 634-an z. êrişkirina Îraqê. Gava *Abo Bekir* sala 634-an z. wexer kir, xelîfeyê duwem *Umer Bin Al-Xettab* projeya *Êrişa Erebî* berdewam kir. Di heyama wî da Ereban sala 636-an z.


serkeftineka girîng li dijî *Emperatoriya Sasanî* di *Şerê Qadîsiyê* da pêkanîn û di wê salê bi xwe da jî serkeftineka din li dijî *Roma Bizantî* di *Şerê Al-Yermok* da li başûrê Sûriyayê[3].

Di navbera Kurdistan, Îraq û Sûriyayê da pêwendiyeka geo-strategî kîp heye. Di seranserê dîrokê da wisa bû ku her êrişeka leşkerî gava Kurdistan dixist bin serdariya xwe, rêya Îraq û Sûriyayê li ber vedibû. Bi vajayî wê jî, kê Îraq û Sûriya bixista bin serdariya xwe, rêya Kurdistanê li ber vedibû. Û bi temamî jî ev yek di dema *Êrişa Erebî* da pêkhat. Piştî biserketina Ereban li dijî *Sasaniyan* di *Şerê Qadîsiyê* da sala 636-an z. û li dijî Romê di *Şerê Yermokê* da, biryar dan ku ber bi rojhilat û ber bi bakur va berfireh bibin. Wan Ji du aliyan va Êriş anîn Kurdistanê:




**Yekem - Çepera Başûr:** *Se'd Bin Abi Weqas* rêberê giştî yê leşkerê Erebî yê vê çeperê bû. Piştî çemên Dîjle û Ferat, çiyayên Kurdistanê wek xêza bergiriyê ya duwem bû ji bo parastina navenda emperatoriyê. Piştî biserketina Ereban di *Qadîsiyê* da *padîşahê Sasanî Yezdegerdê Sêhem* xwe paşva kişand bajarê Kurdan *Hulwanê (Elwan,*


*Elwend)* û ev bajar kir navenda *Rêveberiya Giştî*. Leşkerê Sasanî şande bajarê *Celûla* (nêziya Kerkûkê) ku pêşketina leşkerê Erebî rawestîne. Lê belê Ereban *Celûla û Hulwan* jî sala 636-an z. vegirtin û *Yezdegerd* ber bi rojhilat va vekişiya. Ereban bajarên *Bendnijîn (Mendelî), Xaneqîn û Qermasîn (Karmanşah)* vegirtin û *Hulwan* kirin navenda rêveberiya leşkerî ya êrişbaz[4].




Di sala 640-î da Ereban zora leşkerkî mezin yê *Sasaniyan* li nêziya bajarê Kurdan *Nehawend* birin. Ev bajar *Navenda Rêveberiya* Sasanî bû. Ereban ev bajar jî xiste bin serdariya xwe û paşê bajarê *Dînewer* li *Herêma Çiyan* standin, ku wek "*warê Kurdan*" dihate naskirin. Di pey ra bajarên *Masbezan*, bajarê *Seyrewan* (*Seyrewand*) û bajarê *Seymereh* vegirtin. Di sala 642-an z. da bajarê *Şehrezor* (nêziya Suleymaniya niha) standin û di sala 643-an z. da bajarê *Hemezan* (Amedan, Agbatana, paytextê Padîşahiya Madan) vegirtin. Bi vî awayî beşê herî mezin ji başûr û rojhilatê Kurdistanê ket bin destê Ereban[5].

## Duwem - Çepera Bakur:

Herêma Cizîrê deriyê rojava û bakurê Kurdistanê bû. Li vê herêmê *Êrişa Erebî* sala 639-an bi rêveberiya *Iyad Bin Xenim* (عِياض بن غَنْم) destpêkir. Ereban bajarê *Ruhayê* (Urfa) vegirtin. Di sala 640-î da *Heran, Sirûc û Hesenkêf* birin. Di pey ra *Amed* û *Farqîn* vegirtin û her wisa *Kela Kefirtusî, Niseybîn, Tor-Abdîn, Kela Mêrdînê, Dara, Bazebda û Zozan*. Paşê jî *Erzen-Al-Rom* (Qalqîla), *Bedlîs, Xelat*, heyanî gihîştin Ermenistanê. *Iyad* vegeriya Cizîrê û leşkerek şand *Şengalê*. Leşkerê wî *Şengal* vegirt û hinek Ereb li wir bi cih kirin[6].




Di pey ra *Êrişên Erebî* gihîştin *Meletiyê* li rojavayê Kurdistanê. *Iyad Bin Xenim* serleşkerek bi navê *Hebîb Bin Mesleme Al-Fihrî* ji *Şemşatê* şande *Meletiyê* û ew bajar vegirt. Lê di pey ra bajêr li dijî Ereban serî hilda. Gava *Muawiye Bin Ebî Sufyan* bû waliyê Şam û Cizîre careka din *Hebîb Bin Mesleme* şande *Meletiyê* û bi darê zorê ew vegirt û parêzvaniya bajêr da dest pêwanên Ereb. *Muawiye* ev bajar kir navendeka leşkerî ji bo êrişên ku Ereban dibirin herêmên *Roma Bizantî* ku ev êriş bi navê "Al-Seyf"{êrişên havînê}têne naskirin [7].

Ev bû bi kurtahî rê û şopên *Êrişên Erebî* li ser piraniya herêmên Kurdistanê li başûr, rojhilat, bakur û rojava. Tenha ma ku em du tiştan nasbikin:

- Vegirtina van herêman ku di jêderên erebî da jêra "vekirin" dibêjin, bi aştî derbas dibû yan bi darê zorê?

- Gelo êrişkerên Ereb rastî berxwedaneka Kurdan hatin, gava ku êriş anîn Kurdistanê?

Emê di xelekên dahatî da li van pirsan bikolin.

## Jêder

[1] Al-Tabari: Dîroka Al-Tabari, weşanên Dar Al-Turas, Beyrût, 1387 g., rûpel 2/39.
[2] Abo Henife Al-Deynûri (Ehmed Bin Dawûd: sala 282 g. wexer kiriye): Agahdariyên Berfireh, weşana Dar Îhya Al-Kutub Al-Erebi, Kahîre, 1960 z., rûpel 27.
[3] Walter E. Kaegi: Bizans û Êrişên Îslamî yên Destpêkî, rûpel 112. Ehmed Adil Kemal: Nexşa Êrişên Islamî, rûpel 235.
[4] Al-Tabari. Dîroka Al-Tabarî, 4/27 - 28. Al-Belazuri: Vekirina Welatan, rûpwl 299. û rûpel 29, 179 - 1178.
[5] Al-Belazuri: Vekirina Welatan, rûpel 302 - 303. Al-Ya'qobi: Welatan, rûpel 6. Ibin Kheldun: Dîroka Ibin Kheldun 4/990 -992.
[6] Al-Bealzuri: Vekirina Welatan, rûpel 178 - 182, 189. Ibin Kheldun: Dîroka Ibin Kheldun, 4/955.
[7] Al-Bealzuri: Vekirina Welatan, rûpel 189.